

POPKURD

01/2020 • Jimar 6

e-Kovara Populer Kulturê

SERBANG EMRAH

“BAJO BAJO,
EREBÊ BAJO!”

“HER
HUNERMENDEK
XWEDÎ TARZEKE
CUDA YE. EV JÎ
TARZA MIN E”


Hêja NETIRK | PoPirs



Alî Fîkrî IŞIK | Ji stadyûmê ber bi ...



Mihriban ÎLBAŞ | Behmenê Me...



Merheba PopKurdhezên xweşik û delal. Me gelekî bêriya we kir. We jî dipirsî: “ka POPKURD li ku ma? Em li bendê ne?” PopKurd her diçe bi we xweştir û geştir dibe. Me xwest em hejmareke bi dilê we hazir bikin û va ye gula civatan, kovara we POPKURD bi hejmara xwe ya 6emîn li ber ‘tiliyên’ we ye. De bifermin!

POPKURD
01/2020 • Jimar 6

Edîtor

Mistefa DOGAN

Edîtorê Ditbariyê








Ridwan XELÎL

Berpîrsê Medyaya Civakî

Ömer SÖNMEZ

Rûpelsazî

GrafîKURD

	+90534 325 3629		popkurdkovar		
	PopKurdKovar		PopKurdKovar		popkurdkovar@gmail.com
	popkurdkovar.wordpress.com		channel/UC7OVendzXoCAzJC2wf_KVYw		

NAVEROK

04

RIHLETGUZÎN - THAILAND
Mihemed BÎLEN

10

Kî Kîjan Birc e
PopKurd

12

**Behmenê Me bi Ber Bayê
Xelkê Ket**
Mîhrîban Îlbaş

13

**Rojnamegerên kurd
dipeyivin**
PopKurd

25

We hay jê heye?
PopKurd

27

Roportaj: Serbang Emrah
PopKurd

30

Tengezariya gedeyên ekrad:
zimanê me têra her tiştî dike
Mensurê Zêrînger

32

PopPirs: Hêja Netirk
PopKurd

34

**Ji stadyûmê ber bi kerxanê
ve**
Ali Fikri Işık

36

Me ji 10 kesan pirsî
PopKurd

41

Ez aşpêjekî bênav im
Bênav

44

Ka ji me re bêje?
PopKurd

45

Textora Dînan
Esra Yılmaz

Xwezaya Xama, Şînzeryaya Bêdawî; **THAILAND**



RIHLETGUZÎN

Mihemed BÎLEN

mehmetihsanbilen@gmail.com

Navê hin welatan hene di serê me de, mişt pêşdarazî. Xwe di ava zêr de jî dakin, ji van pêşdaraziyên me safî nabin. Ev peşkên heram ên ku li dawa van welatan ketine, bi çûyin û dîtinê belkî tahir bibin û xumama li ser wan bê rakirin.

Tariya berî berbangê xweştirîn wexta bifirêketinê ye. Em di balafira Thailandê de ne, piştî demeke kurt dê roj hilê û heger şensê me hebe dê berê pencereya me li tavê be, kelecana li ser hed e. Çavên me wekî ku yekem car şahidiya vejînekê bikin, çirûskên efsûnî yên tavê dê me pêşwaz bikin. Ev kêliyên kurt ên xwezayê, wekî sîleyeke qewî ku zingîniyê ji bin guhê mirov bîne, wekî tevzînok bi canê mirov bixîne mirov bi ser hişê xwe ve tîne.

Chinatown-Bangkok-Thailand

Di rojê dawiya payizê de, bi sefereke ku yanzdeh saet diajo, em digihîjin Bangkokê. Di balafira navdar a Boing 747 ya ku zêdetirî pêncsed rêwî hildigire de, mirov

xwe li saloneke mezin a sinemayê hîs dike. Her çend rêwîtiyeke dirêj be jî, bi saya konfira balafira Boing 747 mirov pê naêşe. Wekî gelek kesên cara ewil li balafirgeha Bangkokê peya bûne, ya ku herî zêde bala mirov dikişîne bêhna giran a bajêr e. Ev bêhna sîr û baharatên giran ên ji nefesa mirovan li bajêr belav bûye, ne pêkan e ku dêhna însên nekişîne. Li gorî teoriyeke din a ku em fêr dibin, sedema vê bêhnê bine-saziya xirab a bajêr e û ev bêhn ji cihokên wê yên genî difûre. Her çiqas destpêk bi taybetiyeke bajêr a xirab jî be, mirov dikare bi dilekî rehet bêje tiştêkî din ê xirab ku mirov behsê bike nîn e. Lê aliyên wê yên çê û biçêj gelek in ku hêja ye mirov qalê bike.

Ji bo Bangkokê mirov dikare bêje; bajarê perestgehan. Ev perestgehên bihtîşam ên Bûdîstan, li her aliyê bajêr hene. Thailand yek ji wan welatên rojhilatê dûr ên herî mîstîk e. Ji ber bandora Bûdîzmê ye an ji ber tiştêkî din e nizanîm, wekî baweriyeke berbelav, şiddet li vî welatî hîç nayê pê-



jirandin. Ev mirovên bejin-kurt ên esmer, bi kubarî û rûkeniya xwe tèn nasîn. Her çend baweriya Thailandiyan Bûdîzm be jî, Îslamîyet jî li welêt baweriyeke berbelav e.

Dema em daxilî perestgehekê dibin, peykerên rengzêrîn ên birqonek çavên me xilmaş dikin. Xwediyê van peykeran pêxemberên Bûdîzmê, Siddhatha û Shiva ne. Zimanê li welêt tê bikaranîn Thai ye û fonetîkeke xwe ya taybet heye. Ji ber ku peyvên dawî yên di hevokê de dirêj dikin, ev yek henûnî û sempatiyekê dide zimanê Thai.

Tesadufeke bi navê In The Mood For Love:

Li Bangkokê roj bilez derbas dibin. Piştî her du rojên ewil ên li bajêr em hînî bêhna bajêr dibin. Li nav bajêr wesayiteke taybet tê bikaranîn, navê wê Tûktûk e. Ev motosiqletên sergirtî yên li her derê bajêr, ji ber ku ji taksiyan erzantir in gelek tèn bijartin. Dema em bi Tûktûkê li nav bajêr digerin û

dixwazin biçin Hard Rock Cafeya Bangkokê, sushî-barek derdikeve pêşberî me ku navê wê In The Mood For Love (Dema Evînê) e. Wekî we fêhm kiriye, navê yek ji filmên sêbareya bêhempa yê Wong Kar Wai li restoranê hatiye kirin. Yê carek ev sêbare temaşe kiribe dê nema ji bîr bike. Beşek ji filmê efsanewî yê Wong Kar-Wai, li vê taxê hatiye tesfîrkirin. Li sushî-barê dengê “Yumeji’s Theme” olan dide, mirov dibêje wextî Maggie’ya serlehenga filmê dê bi wê maşa xwe ya nazenîn û bi libasên xwe yên hevrîsimî ji kuçeyekê derkeve pêşiya me... Ev tesadufa xweş, ji bo ez ji Bangkokê hez bikim têra min dike.

Roja sisiyan, balafira me wê berê xwe bide başûrê Thailandê, Kirabiyê. Di pênc rojên li girava Kirabiyê de, em derbarê xwarinên Thai’yan de gelek tiştan fêr dibin. Ji ber ku welatekî zeryayê ye, masî û aferîdên zeryayê ji xwarinên bingehîn ên Thailandê ne. Şorbeya Tom Yum Goong jî yek ji wan xwarinan e û dikarim bêjim ku ya



herî bi lezet e. Di nav de karides, kalamar, ahtapotên hûrik, midye, istringte, gijnîj û gelek gîhayan dihewîne. Birinca bisafran a di nav ananasê de datînin ser sifrê jî, yek ji wan xwarinên balkêş û bi tehm e. Di medbexa Thai'yan de, xwarina herî navdar Pad Thai ye. Ev Noodle'ya taybet a Thai'yan, bi mirîşk an jî bi karîdesê tê çêkirin û di nava xwe de fisteq, hêk, sos û genimê soyayê, sîr, şekir, lîme û baharatên rengîn dihewîne. Kirabi, her çend bi qasî Phuket, Koh Samûî û giravên din ne tûrîstîk be jî, dema dibe saeta xwerinê, li restoranên bajêr peydekirina cîh zehmet e. Di nav wan welatên ku min dîtine de, ji aliyê fiybet ve yek ji ya herî erzan û xwedî medbexa herî dewlemend, medbexa Thailandê ye. Şeva hoteleke çarstêr a li ber zeryayê, -taştê di nav de- bi 35-40 Euroyan e. Fiyetên xwarin, vexwarin, masaj û seyareyên kirê jî gelek maqûl in.

Dema şivê ye, li maseya tenîştê me jin û mêrekî Hollendî hene. Em jî sê heval in. Hevrêyekî me mihacirekî Bulgaryayê ye.

Mêrikê Hollendî yê tenîştê me, bi miraq ji min pirsî ka ez ji kîjan welatî me. Min jî bi awayekî xwezayî got "Ez ji Kurdistanê me", gelek kêfa xwe anî û got "Pir kêfxweş bûm, gelek ji Kurd û Kurdistanê hez dikim..." filan bêvan... Dû re, ji hevrêyê me yê mihacir pirsî ka ew ji ku ye. Wî jî got ez ji Tirkiyê me. Yê Hollendî bi şaş û metel lê vegerand: Bibore lê Tirkiye çî welat e û li ku ye nizamim, tu dikarî hinekî tarîf bikî?

Hevalê min ê mihacir, bi dengê ecêbmayî got "Yaw ev mêrik çî ecêb e, Kurdistanê nas dike, Tirkiyê nas nake." Dawiya şevê yê Hollendî ji bo xatirxwestinê bi rûyekî ken ber bi maseya me ve hat û got "Li Hollendayê dostên min ê ji Kurdistana Tirkiyê gelek in, şevbaş!"

Saetên aram ên Kirabiyê, piştî şivê dest pê dikin. Tûrîst berê xwe didin bar û clubên nav bajêr, peravên zeryayê yên dirêj û fireh ji me re dimînin. Li ber tîrêjên heyveronê, qûma spîboz a peravên Kirabiyê, rengzêrîn



e. Di vê demsalê de ava zeryayê bi qasî nîv kîlometreyê kişiyaye. Em çiqas ber bi zeryayê ve bimeşin jî av ji çongê berjortir naçe. Digel ku pêjn hîç li derûdorê tune ye, tenhayî çavê me natirsîne, ji hêlekê ve di berguhka min de qerpeqerpa potînên Russian Dance'a Tom Waits e.

Destê min ji Kirabiyê nebe jî, em rêwiyê ser riya Koh Samuiyê ne. Hevrê cardin yariyên xwe bi helwesta min a mayinê dikin. Brukî dibêje "Bi ya te be em cihekî din nabînin. Her ku tu cihekî dibînî ji bo wira dibêjî -ji vê derê bastir tune ye, em hinekî din bimînin- û her car tu li gotina xwe poşman dibî". Xebera wan e. Hê gelek carên din min ê wisa bigota. Ji ber ku Koh Samui gelek xweştir bû ji bajarên berî xwe.

Koh Samui, Koh Phangan û Partiyên Heyvaçardehşevî

Koh Samui, yek ji du giravên mezin ên başûrê Thailandê ye. Bûk û zavayên desthinne, ji bo meha hingivîn tîn vê giravê.

Ji ber plajên xwe yên fereh û daristanên bêserûber, gelek kes berê xwe didin vir. Taybetiyeke din a Koh Samuiyê heye; rawestgeha herî nêz a girava Koh Panganê ye. Her heyv, ji her derê dinyayê, bi deh hezaran kes berê xwe didin Koh Panganê ji bo ku beşdarî partiya heyva çardehşevî (Full Moon Party) bibin. Ji bo "Şeva heyveronê" bi rojan hazirî tîn kirin, sehneyên ezamet ên konsertan tîn lêkirin. Ew kesên dê beşdarî partiyê bibin, ji êvar de li bot û keştiyan siwar dibin ji bo biçin perava Koh Panganê. Em jî li botekê siwar dibin. Dema em digihîjin peravê, hingê em fêhm dikin rê bi ku ve ye. Tevdîrên ewlekariyê û cidiyeta organîzasyonê, berî em gava xwe biavêjin giravê xwe dide hîskirin. Piştî em dadikevin, bandajekê bi destê me ve girê didin. Satilekê didin destê me û çend bêr cemed davêjin satilê, dû re şûşeyeke mezin a vodkayê û nizanim çend qutî enerjî li ser vodkayê zêde dikin. Konsert ji êvar de dest pê kirine. Her sehne ji bo celebeke muzîkê ha-



tiye terxankirin. Sehneyên li ser qûma peravê ya gewrîboz hatine lêkirin, ew çend ji hev dûr in ku dengê muzîkê tevlihev nabin. Platformên Rock, Reggie, Jazz, Popê, yên sereke ne. Dema heyv bilind dibe, hingê em baştir têdigihîjin ji bo çî partî li vir tê çêkirin. Heyv bi qasî tepsiyêke qedayîfa Diyarbekirê mezin û bi ezamet e. Li ber muzîka Bob Marley bi hezaran kes pêk ve dans dikin. Pirraniya beşdarên Emerîkî û Ewropî ne. Alkol wekî avê tê vexwarin, serê her kesî germ e. Digel ku her kes ew çend rehet e, ne şer ne jî pevçûnek çênabe. Şev di kêliyêkê de digindire. Dema li saetê dinîhêrim şesê sibehê ye, ji vegeerê re hê saetek maye, hevrêyên min ne xuya ne, gelek kes li ser qûmê di xew re çûne, hinek ji wan jî di nav avê de... Bi hevrêyan re, li cihê ku me li hev kiriye em digihîjin hevûdin. Em tev de bê xew, gêj û sermest in.

Êvarê her kes bi çîrokekê vegeeriyaye ji partiyê. Di şîvê de behsa şevê dikin. Tê fêmkirin ku xwe bi taybetî ji hev vediziyane da bikaribin rehet tevbigerin... Êvara dawî, li Koh Samuiyê, li ber barekê donerfroşek bala me dikşîne, xortê li ber dezgê, bi me

re bi Tirkî diaxive. Em jê dipirsin ka ji ku ye û çî dike li Koh Samuiyê. Dibêje ji Agirîyê me û bi Kurdiyêke fesîh dipeyive. Nemo ye navê wî. Zêdetirî deh salan e li vir dijî û Thaibox dike. Gelek xelat û nîşan girtine. Em dixwazin Thailandê hinek ji çavê wî nas bikin. Bi delalî behsa Thailandê dike. Çend sal berê ji ber ku tûrîstek bi destê welatîyekî Thailandî hatiye kuştin, qrêl 3 roj şîn daniye. Em pîrsa tûrîzma seksê ji wî dikin, ew jî qala sedema vî navê xirab ê li her aliyê dinyayê bi dû Thailandê ketiye dike. Li gorî Nemo; bi tenê li Rojhilata Navîn navê Thailandê bi nebaşî derketiye, ne li her derê cihanê! Hejmara kesên seksa bipere dikin, li Thailandê jî bi qasî her welatekî cihanê ye, ne kêr ne jî zêde. Çawa ku li Amsterdamê kolana Redlightê heye, li bajarên Thailandê jî ji van kolanan hene. Dibêje; bi tenê giravek heye ku bazara keç û kurên emirbiçûk tê de çêdibe, navê wê jî Pattaya ye. Jixwe yên diçin vê gravê ji aliyê Înterpolê ve tên şopandin. Di encamê de em Fêmkirin ku, çêlekeke qûnbirêx, dikare nave garanekê xira bike... Em dilê xwe li Thailandê dihêlin û soza sefereke din didin xwe...



KÎ KÎJAN BIRC E?

POPKURDÊ PIRSÎ KA BURCA WE ÇI YE?
XISÛSIYETÊN BURCA WE ÇI NE? KEREM KIN.



ENGİN SUSTAM • BERAN ♈

Taybetmendiyên Mêrên Beranê:

Şexsiyeteke wan a serbixwe heye. Bi xwe bawer û herwiha otorîter in. Ji tiştên nû hertim hez dikin. Egoîst in.



ŞENER ÖZMEN • SIMBİL ♎

Taybetmendiyên Mêrên Simbilê:

Jiyana bi wan re ne rihat e; Ji ber ku xudan disîplin in. Di malbatê de bavên baş in. Ji detayan ecêb hez dikin û pratîk in.



REWŞAN ÇELİKER • TERAZÎ ♎

Taybetmendiyên Jinên Teraziyê:

Di gelek meseleyan de dudil dimînin û nikarin zûbizû qerare bidin. Kêfa wan ji rîtmê û dansê re zehf tê. Ji detayan hez dikin. Zarîf û piranî rûbiken in. Egoya wan xurt e.



DILAWER ZERAQ û ŞÊXO FILÎK • CÊWÎ ♋

Taybetmendiyên Mêrên Cêwiyê:

Ji hînbûnê pirr hez dikin. Ji xebat, lêkolîn û xwendinê qet aciz nabin. Rûhiyeta wan pir zû diguhere. Rojeke pir bi kêf bin, dibe ku roja din pir xemgîn bin. Carinan pir pozîtîf carinan jî bi qasî ku mirov aciz bikin negatîf in.



MERAL VARIŞLI • KARİK ♎

Taybetmendiyan Jinên Karikê:

Ji bo wan mantiq li pêşiya hestan e. Di her tiştî de mukemeliyetê dixwazin. Kêfa wan ji xebatê re tê. Ji macerayan zêde hez nakin. Dizanin li pey çî ne. Ji hewesên demkî dûr diseknin.



AYHAN GEVERÎ • GA ♋

Taybetmendiyan Mêrên Gayê:

Exlebê wan cidî, xudansebr û bêhnfireh in. Loma jî dibin bavên baş. Bi ser kokên xwe ve ne, li xizim û eqrebayan xwe tim dipirsin. Ne çavbirçî ne lê ji pereyan gelek hez dikin.



FATMA SAVCI • DÛPIŞK ♍

Taybetmendiyan Jinên Dûpişkê:

Hesta wan a edaletê gelek xurt e. Ji jiyaneke bi nîzam û pergal hez dikin. Meraqa wan a li ser ilm û zanînê gelek e. Dema ku hêrs dibin meriv nêzî wan nebe baştir e.



FERZAN ŞÊR • ŞÊR ♌

Taybetmendiyan Mêrên Şêrê:

Xirûra wan ji bo wan gelek muhîm e. Ji dostên xwe re dost in. Ji pesn û methan hez dikin. Ji bo kesên ku hez dikin pir hesûd in.



ÜMRAN ARAN • SATIL ♎

Taybetmendiyan Mêrên Satilê:

Pir zor e ku mirov ji şexsiyeta wan tişteki essehî fêm bike. Ketûm in û li pey mukemeliyetê ne. Di meseleya sadaqatê de gelek sist in. Di demên qerardayînê de jî pir dudil in.

BEHMENÊ ME BI BER BAYÊ XELKÊ KET



GAZINDNAME

MİHRİBAN İLBAŞ

civaknasmehr@gmail.com

Wekî gelek hevnişê xwe, min jî çavên xwe bi filmên Behmen Qubadî vekirin. Jixwe sînemaya me Kurdan jî hema bêje pê re çavên xwe vekirin. Fîlmên Qubadî, di sînorekê de û ji aidiyetê mirov bêpar dide hîskirin. Hêmana “sînor”ê pir eşkere ye û wekî rêyeke zirav û hesas hatiye hevkeşekirin. Gava meriv bi çaveke ji derve(dûr) li çîrokên di filmên Qubadî de dinêre, dibîne ku li ser niqteyêke diyarkirî an jî li ser xêzeke teng derbas dibe. Hundirê otobusê, tabût, hucre, sînor, rê, bêwarî û bêmalî... Filmên Qubadî ji me re dibêjin “Wexta ku em diçin cîhekî xerîb, tu dibê qey her kes dizane ku em ne ji wir in.”

Filma Nîwe-mang, ji filmên Qubadî yê herî balkêş e û wekî berhevkirina hemû filmên wî ye. Bi dîmenên nayîf, nediyariya tekîliya sedem û encaman, tevî vegotina wê ya herikbar, bergeheke çîrokî bi dest xistiye. Ji xeynî vê yekê, bikaranîna jimara 7 û 14ê, di filmê de bayekî mîtolojîk digerin.

Sahneya yekem, di pevçûna dîkan de jê(wer)girtina ji Kîekkegardê û sahneya Mamo ku guhekî ji lawên xwe yekî birîndar dike, qerfekî li ser Van Gogh derbas dibe; rêyî me dide ku “Hûner ne mijûleke/ karûbareke bijarte ye û em qebûl bikin ku hûner ji ber xwexilaskirina tirsê mirinê afirîye. Kîekkegard dibêje “Ez ji mirinê natirsim; ew hebe ez tune me, ez hebim ew tune ye”

Piştî kurteşiroveyêke li ser perspektîfa wî ez dixwazim behsa gazindên xwe bi-

kim. Behmen Qubadî piştî neçar ma ji Îranê derkeve, berê xwe da Stenbol û bajarên din ên dinyayê. Heyf ku derhênerê me yê ewqas mezin, li cîhanê penaber e. Lê di filma xwe ya “Demsala Gergedanan de” Behmen piçekî dilê me hişt. Tevî ku hêman û metaforên xurt tê de hebûn jî em Kurd li bendê bûn ku di filmê de “Kurd” û “Kurdî” jî hebûna. Çimkî Qubadî derhênerê Kurd e û em li civatan bi wî pesnê xwe didin. Qet nebe pariyekê jî ba, nasnameya xwe ya derhêneriya Kurdî nîşan bidaya.

Ya xirabtir; hat guhê me ku Behmen, niha filmeke nû dikşîne û ev jî ne bi Kurdî ye. Hêvî û omdiya min ew e ku ev ne rast be, an na wê dilê temaşevanên Kurd yekcar bimîne.

Niza’m çi bû ji Behmenê me; gelo Monica Bellucci ket aqlê wî??



BAHMAN GHOBADÎ
MONICA BELLUCCI

عنوان
 مبرده «کردستان» نڤه سی
 صاحب و مبردی بدرخان
 بانا زاده
 نڤه مڤدان مدحت
 مریسته ۲۰۰۰ سنه کردستان
 ولایت مهاباد ارمال و سوادکوه
 قرار قضاة نثر و نسیم ارفه جندور
 کردستان خارجه ۸ مری
 ایپورت سادک ایپره بدلی
 ۸۰ مروشدر
 کرمان داهانک مصرمی
 اینیالره مجانا کوردیابور

کردستان

۱۳۱۵

کردلری ایقاپ و تحصیل صنایه تشویق ایپورن شمذک
 اون بش گونده بر نسر اولور کردجه نڤه در

تحقیق کاغذک فی ربکه
 دققی ریپکت مصری سر
 نالف خوبی فی جریده بی
 لاور بدرخان بانا
 مڤدان مدحت بکی
 هر جاره دو مزره جریده با
 بی پیره آرسه ربکم
 کردستان ده بدین خاککی
 بازده روزا جارکی تیت
 تیساندن

۱۳ روزا پنجشبی ده ۳۰ ذوالقعدة سنه ۱۳۱۵ پنجشنبه فی ۹ نisan سنه ۱۳۱۴

بسم الله الرحمن الرحيم

لکودری مروف د بخله لکودری مدرسه و مکتب قنچ هه
 آزی نیشا کردا بکم لکودری چه شر دبه ذولین مظن چه
 دکن چاره شر دکن تجارت چاره دبه آزی حیا حکاکت
 بکم حتی نو کسی جریده کی هولی نقیسی به آف جریده با
 مانا یا عوڤی به لوما وی گیلک کیایی هینن - از هیتی درکم
 کیایا جریده بی زمره بنیسن همی نشت وکی نو چه درین
 رکنین پاشی یهکی دچه دکوه ریده آفه ایدی آزی دست
 مقصدی بکم - (ومن الله التوفیق)

صد هزار شکر و حمد ز خدی تعالی ره آم مسلمات
 خلق بکرن - و طاینا علم و معرفتیه هس و زکادامه - در حقا
 علیاندنا علم و معرفتیه گنگ آیین جلیله واحادیث شریفه
 هین دنیا پیده بیقاس مسلمات هین گوند و بازیرین
 حماده مکتب و مدرسه و جریده هین دنیا پیده چه دبه
 چه نابه جریده دتیسین - حیفا من تیت ز کرداره کسرد
 و گنگل قوما زیده تر خوبی هس و زکانه جامیرن دین
 خوده راست و قوبه خورتن و دیسا و که قوبین دی
 نه خوندانه نه دواندن دنیا پیده چه دبه جیران وان موسوف
 چاره به وی چه بکه فظانن لوما ریله خدیده من آف
 جریده باها تیبسی یا ذنا خدی تعالی باش نو هر بازده
 روزا جارکی آزی جریده کی بنیسیم - نالف فی من کرکه به
 (کردستان) فی جریده پیده آزی بیجا فیمیا علم و معرفتا بکم

حضرت پیغمبر علیه السلاوة والسلام گوتی به « العلماء
 ورثة الانبیاء » آنکو علما وارثین انبیاه ز طرف خدیده
 مامورن و عطف و نصیحتی بدین خلکی ریا قنچ نیشا وان
 بکن لوما گلی علما بکن کردا چاره اون و عطف و نصیحتنا
 بخیزی ددن ولی درقی اون میر و آغا و کرمانجین دانسن
 وان تشویقا طاینا علم و معرفتی بکن ریا قنچ نیشا وان
 بکن هکی اون وی بکن گنهی حیا سعوی و به

HELBET DI VÊ SERDEMÊ DE
 YEK JI KARÊN HERÎ ZEHMET
 ROJNAMEGERÎ YE. **HERTIM EW
 DIPIRSIN Û LI PEY BERSIVAN
 IN. LÊ VÊ CARÊ ME SEWAL KIR
 Û WAN CEWAB DE.** KA WERIN
 EM GUH BIDIN ROJNAMEGERÊN
 KURD.



ERCAN DAĞ

Ji Pasûra Amedê ye. Dibistana seretayî û ya lîseyê, li Edeneyê xwend. Li zanîngeha Selçûkê ya Konyayê, di fakulteya ragihandinê de beşa rojnamevaniyê xwend. Pişt re li Mêrdînê, li ser Kurdolojiyê dest bi lîsansa bilind kir. Ev nêzî 8 sal in di medyaya Kurdî de dixebite. Vêga xebatkarê K24ê yê Stenbolê ye.

PIRSÊN BO ROJNAMEGERAN - 1

BI YA TE LI GORÎ KRÎTERÊN CÎHANÊ REWŞA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇAWA YE?

Di salên dawî de gelek rojnamevanên Kurd karên baş dikin û li gorî krîterên rojnamevaniya cîhanê, bi nûçeyên xwe yê taybet, navê xwe û saziya ku lê dixebitin, li dezgehên ragihandinê yê cuda didin belavkirin. Ev, him ji bo rojnamevanên Kurd û him ji bo rojnamegeriya Kurdî cihê şanaziyê ye. Bêguman di vir de tesîra vekirina televîzyonên Kurdî yê li ser nûçeyan weşanê dikin heye ku merkeza wan li Hewlêrê ne lê ji Ewropayê bigirin heta Emerîka, Rûsya û Rojhilata Navîn nûneriyên wan hene. Di civînên Konseya Yekîtiya Ewropayê, Neteweyên Yekbûyî ya li Emerîkayê, yanî li cîhanê çî mijareke global rû dide, êdî rojnamevanên Kurd hene ku wan mijaran bişopînin, him gelê xwe him jî gelên din agahdar dikin. Loma rewşa niha ya rojnamegeriya Kurdî bo siberojê hêviyekê dide.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Bi ya min problema sereke, kêmbûna dezgehên ragihandinê yê profesyonel in.

Yanî, ji xeynî çend televîzyon û malperan ku navenda wan li Hewlêrê ne û li ser nûçeyan weşanê dikin, dezgehên ragihandinê yê di asta navdewletî de tune ne. Ev jî dibe sebeb ku Kurd ahwal û hedîseyên li welatê xwe zêdetir, ji medyaya biyanî ku li gorî mantalîteya xwe didin nîşandan, dişopînin. Helbet ji bo agahiyên zêdetir û cudatir divê mediyayê cuda bîn şopandin. Lê belê gelek caran meseleyên li ser Kurdan agahiyên ne rast, ji aliyê hin dezgehên ragihandinê ve tîn belavkirin. Gava dezgeheke ragihandinê ya Kurdî nebe yan jî ya heyî ji bo sererastkirina vê xeletiyê kar neke, ev problemek e bo rojnamegeriya Kurdî.

LAZIMIYA SEREKE YA JI BO ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Him ji aliyê zimên û him ji aliyê rojnamegeriyê ve perwerdehiyeke baş divê. Ji bo vê, pêdivî bi fakulteyên ragihandina bi Kurdî û rojnamevanên xwedî tecrube heye. Alternatîfeke din jî ew e ku sazî, komele û dezgehên taybet dikarin dest bidin hev da ku ji bo kesên eleqeya wan ji rojnamevaniyê re heye, akademyên Kurdî vekin. Em rojnamevanên Kurd ên ku li Tirkîyê xwendine, ji ber nebûna perwerdehiya bi zimanê

zirkmakî, neçar man û me ragihandina Tirkî xwend. Hin hevkarên me hene, ji xeynî beşa rojnamevaniyê, ji beşên cuda derçûn. Pişt re di sektorê de bi pratîkê bi pêş ketin. Çawa pêdiviya xaniyekî, bi hîmeke baş hebe, pêdiviya rojnamegeriyê jî bi heman tiştî heye.

DEMA HÛN KARÊN XWE DIKIN ZEHMETIYÊN BI ÇI RENGÎ DERDIKEVIN PÊŞ WE?

Li ser kolanan dema em weşana zindî dikin, car caran gelek kes li derûdora me dicive, bala xwe dide me yanî, di bin çavdêriya hinek kesan de meriv karê xwe bi dilrehetî nikare bike. Wekî din li ser meseleyeke girîng ji bo berhevkirina hin agahiyan, dema em dixwazin xwe bigihînin kesên têkildar zehmetiyê dikşînin. Gelek caran gef li ser rojnamegeran jî tên xwarin û mixabin hin kes êrişan jî dikin.

KESEK HEYE KU DI WARÊ ROJNAMEGERIYÊ DE JI XWE RE KIRIYE ÎDOL?

Kesekî/e wisa tune ye lê kesên divê wek îdol neyên girtin zehf in.





PIRSÊN BO ROJNAMEGERAN - 2

BI YA TE LI GORÎ KRÎTERÊN CÎHANÊ REWŞA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇAWA YE?

Rewşa rojnamegeriya kurdî bilez û bez baştir dibe. Mixabin gel ji zimanê ragihandinê yê bi kurdî fêma nake pir caran. Tevî vê jî dîsa rewşa rojnamegeriya kurdî ber bi başiyê ve diçe, nexasim di vî 15 salên dawî de.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA RO- JNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Ji aliyê siyasî ve em dikarin bêjin bêdewlet bûn an jî bêstatubûn. Mirov dikare bibêje bingeha hemû probleman jî ev pirsgerêka sereke ye.

LAZIMIYA SEREKE YA JI BO ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Helbet Lazimiya Herî Sereke Zimanê Perwerdehiyê Ye. Heke Ev Çêbibe Ziman Jî Standardîze Dibe. Niha Em Mêze Dikin Her Yek Ji Me Dixwaze Devoka Xwe Li Ser Zimanê Standard Ferz Bike. Bi Ya Min Divê Ji Hemû Devokan Em Îstifade Bikin Û Zimanekî Standart Deynin.

MEHDÎ MUTLU

Ev gelek sal in di medyaya Kurdî de kar dike. Niha bo Rûdaw TV'yê li Diyarbekirê dixebite.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA RO- JNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Mixabin em li rojnamegeriyê, bi çavekî siyasî dinêrin. Loma ne li hesabê wan be aliyên siyasî zehmetiyan derdixin pêş me. Zehmetiyeke din jî ew e ku gel me fêma nake gelek caran.

KESEK HEYE KU DI WARÊ ROJNAMEGERIYÊ DE JI XWE RE KIRIYE ÎDOL?

Na, nîn e.





PIRSÊN BO ROJNAMEGERAN - 3

BI YA TE LI GORÎ KRÎTERÊN CÎHANÊ REWŞA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇAWA YE?

Roj bi roj hejmara rojnameyan li cihanê kêr dibe û em dibînin hejmara rojname, mehname, werzname û kovarên kurdan jî him li çar parçeyên Kurdistanê û him jî li hendaranê gelekî kêr bûne. Li ser pirsê we, di nezera min de em dikarin bi giştî bala xwe bidin medyaya Kurdan. Xeta sor a medyayê, azadî ye. Maf û azadiyên medyayê û medyakan di destûrên welatên Ewropayê û Emerîkayê da hatine destnîşankirin.

Li gorî min; kêrîmediyayê kurdî di vî warî de gelekî zêde ne. Him sedemên derveyî hene û him jî yên navxweyî. Sedemê derveyî ez dikarim bi destnîşankirina dagirkeriyê Bakurê Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê destnîşan bikim. Çimkî hîn jî rojname, kovar, weşanxane û televîzyoneke kurdan li van parçeyan nikare bi awayekî azad bi karê xwe rabe û lawaz dimîne. Sansur li ser wan weşanên medyaya kurdan a li Bakurê Kurdistanê û Rojhilatê Kurdistanê heye. Di proseya wisa de, wê

MEHMED SALIH BEDIRXAN

Li Qosera Mêrdînê ji dayik bûye. Li zankoya Hacettepeyê ya Enqerê lîsansa dîrokê, li Zankoya Dêxoda Tehranê Zimanê Farisî, li Zankoya Artukluyê ya Mêrdînê master xwendiyê û niha jî di beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de li heman zankoyê xwendekar e.

Di sala 2009an da dest bi rojnamegeriyê kiriye. Ligel ajansên DIHA, BasNews, AvaToday, Hengawê û ligel rojnameyên BasNûçe, Bas kar kiriye. Niha jî edîtorê beşa kurdî yê BasNewsê ye.

medyaya Kurdan nikaribe bigihê asta medyaya cihanê.

Çimkî em dibînin, medyaya Komara Îslamî ya Îranê, rojeva Rojhilatê Kurdistanê û medyaya Tirkîyê jî rojeva Kurdên Bakurê Kurdistanê diyar dike.

Eger em bînin ser sedema navxweyî jî ez dikarim Başûrê Kurdistanê û Rojavayê Kurdistanê mînak bidim. Li van parçeyên welêt jî medya di bin siya hizbên siyasî de ye. Medyakar, heta cihekî dikarin kar bikin. Medyakar heta cihekî dikarin behsa hin meseleyan bikin. Em dibînin li Rojavayê Kurdistanê rojnameger bi salan tî zindankirin. Herwiha em dibînin li Başûrê Kurdistanê malên rojnamegeran tî gulbarankirin.

Metirsî li ser jiyana rojnamegeran û medyakan heye.

Hikûmetên welatên pêşketî bo azadiya medyayê bernameyan datînin û li ser wan pirsan kar dikin. Her sal DW, DPA, AFP, Reuters bi piştevaniya hikûmetên xwe korbendên medyayê li dar dixin û di wan korbendan de azadiya medyayê û medyakan tevera sereke ye. Cihê mixabîniyê ye ku hîn jî ti ajans û dezgeheke kurdan ku di warê medyayê de bigihê wan dezgehên cihanî tune ye.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Medyaya kurdan sazê nasaz e. Hêzeke medyaya kurdan tune ye û karîgeriyeke mezin a medyaya kurdan li cihanê nebûye. Herwiha medyaya kurdan di warê raberkirina pirsê serweriya Kurdistanê de, ne texayûlek bi cihanê re ne jî bi Kurdan ra çêkiriye. Medyaya kurdan pirsê serweriya Kurdistanê çiqasî ji xwe re kiriye bar? Em lê dinerin di warê gotarê de, li ser vê pirsê her dezgeheke medyaya kurdan ji xwe re meqamek çêkiriye.

Welatên wekî Amerîka, Çîn, Almanya, Rûsya û hwd... Asasê dewlêtên xwe bes naspêrin artêşê û aboriyê, dispêrin medyayê.

LAZIMIYA SEREKE YA JI BO ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Divê em heqê hin rojnamegerên serkeftî yên kurdan nexwin. Lêbelê di nezera min de, nebûna rojnamegerên serkeftî pêwistiya sereke ya medyaya Kurdan e. Em li rojname, kovarên beriya bi 100 salî yên kurdan binêrin, di warê hêmanên rojnamevaniyê de bêqisûr in. Zimanê gotar û nûçeyan, herikbar û sade ne. Gelo çima? Ji ber ku edîbên rojname û kovaran ên sedsala 20an ên Kurdan, hemû xwenda û zana bûn. Haya wan ji bîrên sedsala 20an hebû û ev yek di kelepura wan hiştîyê de xwe dide der. Rojnameya Kurdistanê, Rojî Kurd û herwiha Ronahî û Hawar jî nimûneyên baş in bo ku kurd ji wan îstifade bikin û bîngeheke mukim ji rojnamevaniya û medyaya kurdî re deynin.

Bes mixabin îro herkesek dikare ji xwe re malperekê veke û bêyî haya wî ji meseleya nûçe û raportan hebe, xwe bike beşeke ji hizbeke siyasî yan jî rêxistineke dînî û tê de goya “rojnamevaniyê” bike.

DEMA HÛN KARÊN XWE DIKIN ZEHMETIYÊN BI ÇI RENGÎ DERDIKEVIN PÊŞ WE?

Di pirsê yekem de min hinekî behsa meseleya azadiyê kiribû. Mixabin nebûna azadiyê tesîrê li rojnamevanên Kurd dike. Serweriya welatê me, hîn li 2 parçeyên welatê me ne di destê me de ye. Em tûşî sansur û guvaşan dibin. Destê me di dilê me de em kar dikin. Hevkarên me tî girtin û zindankirin. Ji karên xwe tî dîrxistin. Gelek caran rojnamegerên Kurd bi mirinê re rûbirû dimînin.

Li gorî zanyariyên min; hîn aqûbeta 2 rojnamegerên Kurd ên di destê DAIŞê da nayê zanîn.

KESEK HEYE KU DI WARÊ ROJNAMEGERIYÊ DE JI XWE RE KIRIYE ÎDOL?

Belê; Xelefê Zêbariyê helbestvan, rojnamevan û Pêşmerge îdolê min e. Xelefê Zêbarî, di 12ê Adara 1948an de, li devera Zêbarî ya li Başûrê Kurdistanê hatiye dinyayê. Di sala 1970yî de, Zanîngeha Mûsilê qedandiye. Piştî 3 salan tevî Şoreşa Îlonê bûye û bi piştevaniya helbestvanê navdar ê Kurd Sebrî Botanî bûye bêjerê Radyoya Dengê Kurdistanê. Xelef, edî dibe dengê Şoreşa Îlonê. Xelef, bi rakirina çekê Pêşmerge, li radyoyê bêjer û rojnameger, bi belavkirina dîwanan helbestvanê welêt bû.

Xelefê Zêbarî, herwiha yek ji damezrînerê Beşa Kurdî ya Radyoya Dengê Emerîkayê bû li gel Homer Dizeyî. 20 salan li VOA'yê bernameya “Ferheng û Toreya Kurdî” birêve biriye. Herwiha li Emerîkayê bi kurdî kovar derxistiye. Hevpeyvîn bi nivîskar û rewşenbîrên kurd ên Kurdistanê û cihanê re kirine. Arşîveke mezin a Kurdî berhev kiriye. Kedkarê mezin Xelefê Zêbarî, di 25ê Gulana 2018an de koça dawî kiriye.



BEDÎRHAN MUHSÎN AYBAR

Li Geverê hat dinyayê. Ev 10 sal in li Stenbolê dijî. Li Zanîngeha Boğaziçiyê beşa Wergerê xilas kir. 3 sal in di Medyascope TVyê de edîtorî û pêşkeşvaniyê dike.

PIRSÊN BO ROJNAMEGERAN - 4

BI YA TE LI GORÎ KRÎTERÊN CÎHANÊ REWŞA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇAWA YE?

Rewşa rojnamegeriya Kurdî baş nîn e, ya rast. Ji ber ku ew, ji standartên klasîk û girîng ên rojnamegeriyê bêpar maye. Xwedî dîrokeke dirêj e lê hê jî gelek tişt rûneniştine.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Problema sereke ew e ku siya îdeolojiyê gelek dikeve ser rojnameger(iyê). Her wiha ji aliyê zimên ve jî hîn gelek problemên micid hene.

LAZIMIYA SEREKE YA JI BO ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Rojnamegeriya Kurdî pêwistî bi sazî û dezgehên xurt û serbixwe yên bikaribin xwe ji partî û aliyên siyasî dûr bigrin heye.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Hin bûyer û rewş çêdibin ku obcektîfbûn gelek zehmet dibe, hin caran otosansûr hewce dibe û ev yek meriv tehmexweş dike. Her wiha ji ber ku zimanekî standard-bûyî nîne, hin caran em mecbûr dimînin zimanekî sûnî bi kar bînin.

KESEK HEYE KU DI WARÊ ROJNAMEGERIYÊ DE JI XWE RE KIRIYE ÎDOL?

Nexêr, îdolê min nîn e.





MURAT BAYRAM

Ji bo medyaya Kurdî û medyaya cîhanê gelek kar kirin. Di Pêşbaziya Enstîtuya Rojnamegeriyê ya Reutersê ya Zanîngeha Oxfordê de bi ser ket û bû beşdarê bernameya “fellowship”ê. Ji Gulana 2016an û vir ve edîtoriya beşa Kurdî ya Bianetê dike. Kitêba wî ya bi navê “Belkî Îşev Binive” ji nav weşanên Avestayê derket.

PIRSÊN BO ROJNAMEGERAN - 5

BI YA TE LI GORÎ KRÎTERÊN CÎHANÊ RE- WŞA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇAWA YE?

Ji bilî sedemên ji derve (asîmîlasyon, zêde polîtîkbûna kurdan, neyîna piştgirî û bazara aborî) em rojnameger, bîner û xwendevanên kurd rojnamegeriyê wek disiplîneke zanistî an jî pîşeyekê nabînin. Ji ber wê; piştî Ronahî û Roja Nû em nikarin behsa disiplîna rojnamegeriya navneteweyî ji bo kurdî bikin û çênabe em kurdî û medyaya cîhanê deynin ber hev.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA RO- JNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Di pîrsa yekem de min bersiva vê jî daye.

LAZIMIYA SEREKE YA JI BO RO- JNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Divê em ji bilî naverok û zimên, li ser şêwe û pîvanên rojnamegeriya kurdî bicivin. Êdî divê mînaqêşeyên li ser rojnamegeriya kurdî ji rêziman û rêberên rastnivîsînê bibore!!! Raçandina nûçeyan, teknoloji û şêweyên nû yên nûçegihaniyê divê bikeve nav rojeva rojnamegeran .

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA RO- JNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Kurdbûn. Kêşeyên kurdbûnê ji bo her karî çî bin, ji bo rojnamegeriyê jî ew in. Bêdesthilatî, bêdewletî, jixwenebawerî...

KESEK HEYE KU DI WARÊ ROJNAMEGERIYÊ DE JI XWE RE KIRIYE ÎDOL?

Ji dîrokê Celadet. Ji îro Mahmut Bozarlan û Hatice Kamer. Ji dinyayê Patrick Kingsley û Robert Fisk...





SALİH TURAN

Di sala 1977an de li Batmanê ji dayik bûye. Ji beşa Rojnamevaniya Giştî ya Zanîngeha Marmarayê mezûn bûye. Heta niha di gelek sazî û dezgehên medyayî yên Kurdî de kar kiriye û niha jî heman karê rojnamevaniya Kurdî berdewam dike. Ji bilî karê rojnamevanî, mijûlî bi nivîs, werger, ceribandin û helbestên Kurdî jî kiriye ku salên borî di hin kovar û malperên Kurdî de hatine weşandin. Her wiha pirtûkeke helbestan a Salih Turan a bi navê 'Dayik Bê Roj in' sala 2014an hatiye çapkirin.

PIRSÊN BO ROJNAMEGERAN - 6

BI YA TE LI GORÎ KRÎTERÊN CÎHANÊ REWŞA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇAWA YE?

Her çi qas rojnamevanî û ragihandin karekî pîroz ê xizmeta gelemperiyê û raya giştî bê qebûlîkirin jî mirov nikare bêje ku ji sedî sed krîterên ehlaqî/etîk yên vî karî tene bicihanîn.

Dezgehên herî populer û xwedî kevneşopa sedsalî yên medyayî bi xwe jî di bin banê sermayedarên mezin de, ji raya giştî wêdetir ketine xizmeta deshilatdaran û weşanên xwe li gorî mêzîneke polîtîk berdewam dikin.

Dema ku em vê dibêjin, herwiha em pêşketina teknîkî û teknolojiya nû ya ragihandinê jî bi bîr dixin û dizanin ku ji rojnamevanan re gelek derfetên nû yên hêskariya ragihandinê çêbûne.

Rojnamevaniya obcektîv û ragihandina notr bi xwe jî ti car nayê maneya bêalîbûnê. Medyaya cîhanê ya serdest dibe ku tenê di nivîsandina hêmanên raportên xwe de, bi teoriya karê rojnamevanî dixebite lê bi naverok û balkişandina ser bûyeran xwedî hizreke aliyên serdest e.

Rojnamevaniya Kurd-Kurdî jî êdî mirov dikare bêje ku ji aliyê ragihandin û belavkirina nûçeyan ve gihîştîye asta teknolojiya hemdem. Her çi qas di hinek warên bikaranîna medyaya civakî û teknîka honandina raportên xwe de qels be jî, Kurd jî di medyaya û karê rojnamevaniyê de di asta cîhanê de ne êdî.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Rastîyeke rojnamevaniya me kurdan heye ku gelek hempîşeyên me ji ber weşanên di wan de kar dikin û ew weşan bi xwe jî di bin banê partî û rêxistinên de ne, êdî ew jî xwe wekî neferên wan îdeolojî û helwestên siyasî dibînin. Pîvana sereke ya agahdarkirina ehlaqî ku krîtereke girîng a rojnamevaniyê ye ji bîr dikin û nûçe/bûyera herî basît jî ji obcektîvîyê dûr, bi şîroveyên jêrxaneya partî û rêxistinên dinivîsin û belav dikin.

Her dezgeheke medyayî, xwedî helwest û polîtîkayeke weşanê ye. Heta radeyekê helwesta wê dezgeha medyayî qebûl e. Lê ragihandin karekî belavkirina tiştên bûyî ye. Em çi dikin? Em beriya ragihandina bûyerê bi şîrove û nirxandinên xwe yên bûyerên nebûyî dixwazin karê rojnamevaniyê bikin.

Ev şaşiyêke mezin e û me (medyaya kurdî) ji rastiya wê kêliya bûyerê dûr dixê.

Nexweşiya herî mezin a rojnamevaniya kurdî bêguman alîgiriya bi korîtî ye ku pîvanên ragihandinê jî dide jibîrkirin.

LAZIMIYA SEREKE YA JI BO ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Her çi qas em xwedî nêrîn, feraset û aliyekî siyasî bin jî pêwîst e berî her tiştî em di karê xwe yê rojnamevaniyê de, bibin neferekî gelê xwe û li şûna alîgiriya aliyekî siyasî, di xizmeta neteweya xwe de karê xwe bikin.

Ez nabêjim rojnamevan/medya çima alîgirê aliyekî siyasî ye. Lê bi ya min divê em xwe ji vê nexweşiya pêlîstina bi agahiyên rast rizgar bikin û êdî nehêlin pêbaweriya me nemîne.

Ya rast ew e ku rojnamevanê kurd bi karê ku dike bikare bikeve dilê hemû aliyên kurdî û bi rojnamevaniya ku dike jî baweriyê bide hemû aliyên rikeberiya hevdu dikin.

DEMA HÛN KARÊN XWE DIKIN ZEHMETIYÊN BI ÇI RENGÎ DERDIKEVIN PÊŞ WE?

Dema behsa rojnamevaniya kurdî tê kirin medyaya bi zimanê kurdî kar dike fêma dikim.

Her çi qas kurd bin jî, yê ku bi zimanên tirkî, erebî û bi zimanên din karê rojnamevaniyê dikin li derveyî dihesibînim.

Em miletekî bindest in û rojnamevaniya me jî mixabin bindest e. Dema li qadê karê xwe dikî ji navê dezgeha xwe ya medyayî bigre, heta aliyê ku ew dezgeh girêdayî ye, dibe mijara lêpîrsînan û astengiyan.

Bi taybetî li welatên ku kurdê herî bêlayan jî tîna terorîzekirin, karekî pir zehmet e rojnamevaniya kurdî.

Heke tu kurd bî û bi ser de jî rojnamevaniya kurdî bikî, divê ji dozvekirin, lêdan, heqaret û girtinê re her tim amade bî.

Yanî li cihê ku em lê dijîn, Kurd jî zimanê wan jî bindest e û rûbirûyî gelek zehmetiyan tîna.

Pêşketina teknolojiya ragihandinê û dezgehên me yê medyayî jî nikare rojnamevaniya me ji vê bindestiyê rizgar bike.

Herwiha yek ji zehmetiya herî mezin jî ew e ku divê tu bala kurdan bidî ser rojnamevaniya ku bi zimanê wan dikî. Ango bikevî reqabeteke bêeman û wan ji bando- ra medyaya zimanê biyanî rizgar bikî û bala wan bikşîni ser zimanê wan.

Dîsa jî rojnamevaniya kurdî tevî her cure astengî û kêmbûna derfetan û xwendin û şopandina ji zimanên biyanî kêmtir jî li ber xwe dide. Bi ya min li gorî salên destpêkê, rojnamevaniya kurdî gelek qonax derbas kirine û niha ne li gorî daxwazê be jî, bûye xwedî hêz û bandoreke xuya li ser civaka kurd.

KESEK HEYE KU DI WARÊ ROJNAMEGERIYÊ DE JI XWE RE KIRIYE ÎDOL?

Mîrê ziman û rewşenbîriya kurdî Mîr Celadet Alî Bedirxan bi rêzdarî bi bîr tînim.

Ne ji bo min û rojnamevanên kurd tenê, bi ya min divê ew îdolê her kurdekî be ku bi 'Hawar' a xwe bi hawara me ve hatiye.

Mîr Celadet, bi xebatên xwe yê dilsozane û dewlemend, bûye rênîşanderekî bêminak ji rewşenbîrî, ziman û rojnamevaniya kurdî re.

Loma jî divê em li derve li îdolan negerin. Ew li ber serê me û li teniştê me ye. Bi ked û xîreta xwe hê jî palpiştê xebata me ye.



PIRSÊN BO ROJNAMEGERAN - 7

BI YA TE LI GORÎ KRÎTERÊN CÎHANÊ REWŞA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇAWA YE?

Bi ya min asta rojnamegeriya Kurdî, li gor krîterên rojnamegeriya cîhanî zêde lawaz e. Çend sedemên vê hene. Ya yekemîn û sereke, mixabin em ne xwedî medyayeke ne ku hemû cûreyên rojnamegeriya (Piranî em li ser şer dinivîsin lê jîyan bi hemû rengê xwe heye) cîhanî xwedî lê dike.

Ev yek ne tenê girêdayê şerê berdewamî yê bi salan e li ser Kurdan e, di heman demê de girêdayê netewebûyînê/dewletbûyînê ye jî. Dema rojnamegeriya Kurdî bû xwedî netewekê, an zimanê standart an jî li cîhanê wek netewe hat nasîn wê demê bikaribe bikeve nav qada medyaya cîhanî, ji ber ku rojnamegeriya Kurdî zêde nikare bi saziyên cîhanî re danûstandinê bike.

Ya duyem; profesyonelbûn e. Bi qasî ku ez dişopînim, ez dikarim bêjim ku kesên di medyaya Kurdî de dixebitin zêde ked didin ser karên xwe lê mixabin ne profesyonel in an jî ji hêla aboriye ve ne rihet in. Ti enstityên me yên ku rojnamegerên Kurd di bin banê xwe de bîne cem hev an

ZOZAN YAŞAR

Ji Liceya Amedê ye. Li Zanîngeha Stenbolê beşa Zanistên Siyasî û Têkiliyên Navdewletî xwend. Di VOA'yê de rojnamegerî kir. Niha li Brîtanyayê ye û li ser Polîtîkaya Rojhilata Navîn masterê dike. Herwiha rojnamegeriya freelance dike.

jî perwerdeyeke baş bide tune ye, an atolyeyên rojnamegeriyê tune ne ku tekiliyên navnetewî xurt bikin. Piranî li ser dilxwaziye, an jî bi budçeyeke kêr xwe bi rê ve dibin. Ez nabêjim hewldan tune ye lê nikare xwe bigihîne asteke maqûl. Divê em li ser sedemên wan bisekinin.

BI YA TE PROBLEMA SEREKE YA ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Kêmasiya bazara zimanê Kurdî problema sereke ye. Zimaneke ku bi salan hatiye qedexekirin û welatekî ku hatiye dagirkirin, di bin banê zimanê dagirkeriyê de nikare xwe di rojnamegeriya Kurdî de baş bi pêş bixe. Piraniyê Kurdan, ji bo ku bîr fêmkirin, bi zimanê Tirkî an jî Erebî dinivîsin, gelek kurd xizmeta rojnamegeriya Tirkî an jî Erebî dikin.

Ji yekemîn rojnameya Kurdî ku Miqdad Mîdhed Bedirxan cara yekem li Misrê derxist heta niha, gelek xebat hatin kirin lê kesên ku dikarin bixwînin pir kêr in. Dema ez 15 salî bûm min soz da xwe ku heke ez rojekê bixebitim divê ez ji zimanê Kurdî pere qezenc bikim. Dewlemend nabim lê niha li Brîtanyayê ji Kurdî+Îngilîzî pere qezenc dikim.

LAZIMIYA SEREKE YA JI BO ROJNAMEGERIYA KURDÎ ÇI YE?

Ziman, pere û azadî... Ev sê xal gelek girîng in, ji ber ku em ne xwedî zimanêke standart in. Kurd zîrek û zana ne lê perê wan tune ne ku karên baştir bikin, xala dawîn jî wekî min li jor got em ne têra xwe azad in.

Em li literatura cîhanê dinêrin. Kar û pêşveçûna medyaya Kurdî di her warî de ji xwe re rê, rêbaz û armancên cuda esas girtine. Medyaya heyî girêdayî hizb û tevgeran e. Ev yek di nav xwe de çarçoveyekê çêdike û ji keynî tiştên diyarkirî, deriyên xwe ji hemû fonksiyon û derfetên mediyayê re digrin. Mîsal lazim e mirov bipirse: Gelo medyaya kurdî ji bo axaftina zimên, parastina nasnameyê, têgihiştina civakî, hevpariya çand û hunerê, mîsyoneke çawa girtiye ser milê xwe? Vê mîsyonê çawa bi rê ve dibe? û bêguman çima bi ser nakeve? Axir em ê bibînin ku hemû aliyan, hebûna gel bi xwe ve girê daye, li gorî xwe hewl dide bi riya mediyayê di bin destê xwe de tiştêkî balkêş ava bike. Ev yek bi rastiya gel re nakokiyekê derdixe holê. Di heman demî de, ev mediyayê heyî, piranî li dijî hev tên bikaranîn. Ev yek jî bandoreke xirab li ser baweriya gel çêdike. Mîsal di 30-40 salên dawî yê Rojhilata Navîn de Al-Cezire, bi heman helwestî di nava civaka giştî û aliyên siyasî de bûye sedema texrîbateke mezin. Yanî di rastiya xwe de him medya, him hemû saziyên çand û hunerê, eger rasterast bi destê aliyekî-hizbeke werin kontrolkirin, rêgezên herî sereke di nav xwe de pêk neynin; ixtîmala serkeftinê nîn e

DEMA HÛN KARÊN XWE DIKIN ZEHMETIYÊN BI ÇI RENGÎ DERDIKEVIN PÊŞ WE?

Rojnamegeriya Kurdî ne karekî hêsan e, ji mala Bedirxaniyan bigre heya Apê Mûsa gelek bedel dane û hê jî dide. Tu ti car nizanî dê çî were serê te. Ewlehiya te tune ye, wekî ku niha gelek rojnamegerên Kurd di zindanan de ne.

Em bi hêsanî nikarin lê bikolin û xwe bigihînin materyalan an jî bi rihetî em nikarin li her çar parçeyên Kurdistanê bixebitin. Mixabin her dem giraniya îdeolojiyan heye û ev jî ji bo me pirsgrêk e.

Di rojnamegeriya Kurdî de bedel biha ye lê qedr kêr e. Kes qedr û qîmetê nade karê te. Ez bawer im piraniya hevalên min, nivîsên min û yê rojnamegerên Kurd naxwînin.

Gelek zehmetî hene lê...

KESEK HEYE KU DI WARÊ ROJNAMEGERIYÊ DE JI XWE RE KIRIYE ÎDOL?

Çi pirseke dijwar e!

Helbet li her çar parçeyên Kurdistanê gelek rojnamevanên hêja, jîr û zîrek hene lê dema em rojnamevanên ji bakûr bi nav bikin, ez dikarim bibêjim kêfa min ji jêhatîbûna Fehîm abê (Fehim IŞIK) re tê lê êdî nivîsên wî yê bi Kurdî nabînim. Xecê (Hatice Kamer) Rojnamegereke baş e û karê xwe bi profesyonelî dike.

Bila Zinare Xamo bibe Rojnameger...



WE HAY? JE HEYE!



BERHEMA NÛ YA KRÎSTÎN ÖZBEYÊ: ÇIYA

Ev demeke dirêj e pêjna helbestvana Kurd Kristin Özbeyê nayê. Özbeyê berhema xwe ya nû ji bo POPKURD'ê nîşan da. Navê berhema wê ya nû Çiya ye û hêj 6 mehî ye. Em li ser navê kovarê, emreke dirêj bo lawê wê divên.

WE HAY? JE HEYE!

PIŞTÎ VÎ FOTOYÎ EDEBIYATA KURDÎ TÊK ÇÛ!!!

Îbrahîm Xelîl Baran, Erol Şaybak, Ömer Faruk Baran, Îmad Bernas, Mem Jan û Nûhat Deştî li ser maseyekê ne. Li ber wan tirşika fasûliyan heye û bi ihtimaleke mezin li ser edebiyata pre-modern û modern a Kurdî sohbetê dikin. Îbrahîm Xelîl

Baran, dema ku ev risim li ser înternetê belav kiribû, li ser wiha nivîsîbû: “Ew ciwanên ku dê pêşengiya edebiyata Kurdî bikin li ser vê masê ne.” Lê piştî çend salan ew ciwan, fenaî morikên tizbiyê ji hev belawela bûn mixabin. Yanî piştî vî fotografi edebiyata Kurdî têk çû...



ROPORTAJ

SERBANG EMRAH

**“HER
HUNERMENDEK
XWEDÎ TARZEKE
CUDA YE. EV JÎ
TARZA MIN E”**

Serbang Emrah vê pêlê ji hêla gelek kesî ve tê axaftin. Hin kes wî rexne dikin û dibêjin muzîka Kurdî texrîb dike. Lê bi deh-hezaran guhdar û şopînerên wî hene ku ji wî û muzîka wî gelek hez dikin. POPKURD ji Serbang Emrah pirsî, wî jî bi dilsozî bersiv dan. De ka em guh bidinê.



Ji bo kesên ku te ji nêz ve nas nakin, tu dikarî hinekê behsa xwe bikî?

Berî her tiştî ez dixwazim vê bêjim; em bi malbatî hunermend in. Birayekî min li tembûrê dixê, birayekî min ê din li orgê dixê. Bavê min jî stranbej e. Ez bi eslê xwe ji Vartoyê me lê di sala 1991an de li Diyarbekirê hatime dinyayê.

Gelo Serbang Emrah çawa dest bi muzîkê kir?

6 salan berê, min û lawê meta xwe, li kolana Îstiklalê ya Stenbolê, me dest bi muzîka kolanan kir. Sala 2012 bû. Wî li gîtarê dixist min jî stran digotin. Gelê me zehf ji me hez kir. Vîdyoyên me li ser înternetê belav bûn. Gelek şopînerên me çêbûn. Bi rastî eleqeya milletê me gelek baş bû. Pişt re ez li dawet û şahiyên derketim ser sehnê.

“BAJO BAJO, EREBÊ BAJO!”

Nexasim ew replîka “Bajo bajo, erebê bajo!” êdî bûye fenomen di nav gel de. Ew çawa çêbû?

Dema ez li sehneyên dawet û şahiyên

derdiketim, coşeke mezin a gel hebû. Bi rastî vê coşê ez gelek motîve dikirim. Rojekê li ser sehnê, lingê min şemitî û ez ketim erdê. Wê gava ku ez li erdê ketim, wekî ku li ser dîreksiyonê bim, min destê xwe bir û anî û min got: “Bajo bajo, erebê bajo!” Ev yek wisa belav bû û êdî bû semboleka bi min re.

Gelo te dil heye tu albûmekê derxî?

Ya rast, di vê serdemê de albûm kêmtên guhdarkirin. Gel berê xwe dide ser klîb û stranên li ser înternetê. Ez jî niha vîdyoklîban dikşînim û li ser kanalên înternetê belav dikim. Kesên bixwazin guhdar bikin, bi rihetî dikarin bigihîjin stranên min.

Reaksiyonên guhdaran çawa nin li hemberî muzîka te?

Bi piranî rexne û gotinên xweş dikin lê carna rexneyên xirab jî tên. Ev pir normal e. Ez jî ji hin muzîsyenan gelek hez dikim lê kêfa min ji muzîka hin hunermendan re nayê. Rexne normal e lê dema gotinên giran tên kirin ez li ber dikevim.

“BILA HER CURE Û STÎL DI MUZÎKA KURDÎ DE HEBIN, HÛN ÇIMA ACIZ DIB-IN?”

Tam li ser vê ez bipirsim. Hin kes li ser Twitter an jî li ser malperên înternetê muzîka te rexne dikin. Tu li ser vê dixwazî çi bibêjî?

Her hunermendek xwedî tarzê e. Şivan Perwer, Şahê Bedo... Ev hemû muzîsyen xwediyê tarzên xwe ne. Tarza min jî ev e. Ez wilo kilaman dibêjim. Bila her tarz û stîl di muzîka Kurdî hebe. Çima ji vê yekê aciz dibin?

Serbang Emrah herî pir kîjan muzîsyenê Kurd diecibîne?

Şivan Perwer, Şahê Bedo, Xêro Abbas, Aram Serhad, Ciwan Haco û gelekên din... Dengbêjî jî ji bo min gelek cuda ye. Ez jî guhdariya dengbêjan gelek hez dikim.

Di muzîkê de xeyala te ya herî mezin çi ye?

Min di serî de jî got. Em malbeteke muzîsyen in. Ez dixwazim tevî malbata xwe, li Ewropayê ji bo Kurdên me yên li wir, konsert û şahiyên mezin çêbikim. Daxwaza min a herî mezin ev e.




TENGEZARIYA GEDEYÊN EKRAD: ZIMANÊ ME TÊRA HER TIŞTÎ DIKE



MENSÛRÊ ZÊRÎNGER
mansurk567@gmail.com

Gelî xwînerên ‘ezîz ên POPKURD’ê, ji bajarê Dihê û Misirca munewer, ji cih û warê Kurdan ê bijarte, ji navenda ‘ilm û hunera Kurdî, ji Sêrtê, ji Sêrta “me” silav û gulav...

Ciwanên Kurd, ji ber xwepîrozwerkirina netewa xwe, ji derb ketine, li navikê didin. Kesên bi xebatên xwe Kurdbûna xwe îspat kirine; nîrxên gelê Kurd, dîkin nîvîşt û bi xwe re digerin. Ji ber vê, ciwan nikarin lê zêde bikin û her wiha her kes, ji qîmetnezana ciwanan gilî, gazind û loman dîkin. Kes xwe bi qanûna “bandor-bertek”ê nawestîne. Dikemitînin, diqelînin, diperçiqînin, bi hezaran şikla jê çêdikin, lê



“Gul li şaxê/kulîlk di guliyê xwe de geştir e.

Ku ji avê derkeve/masî dimire/rast e,

Meriv meriv gotiye/masî jî/masî...

Em./ne masî ne, ne gul in, ne kulîlk/-

Bi çavek xwas gava lê bê nihêrtin/-

Lê em jî/ ji hêlîna xwe ya/çande-civakî/

Ku dûr bikevin/ji wan gelek/ne têveltir in.”

Rojen Barnas

kes nîn e, wekî şêran bixwe. Jixwe kes bîra nêçîrvaniyê jî nabe di nav hevqas derfetên netewên din de, tê çawa ciwanên xwe, (bê meh’ne) bi zimanê xwe orgazm bikî, bi çanda xwe, bi civaka xwe, bi dîroka xwe? Aniha, zanayên me li cihekî kom bûne, dibêjin; “Kurdno! bi xîret bin, bixebitin, dewlemend bin” lê em wekî her neteweyî tevnerin, em pîroz in, sînorê me gelek in, me xwe pîrozwer kiriye, me xwe daniye nîrvanayê, destê ciwanan nagihîje me, yê dest davêjin jî em pê digrin dişikînin; di ser de em radibin dibêjin, ka pêşketin, ka serkeftin?

Belê, zeman diguhere, divê mirov nîrxên xwe û naveroka jiyana ku çiqas diçe berfirehtir dibe, li hev gêre bike, geş bike, pêşkeş bike. Lazim e mirov ji bîr neke, heta mirov dest pê neke û derfeta destpêkirinê nede nîfşên nû, ne pêkan e; mirov qala kalîteyê bike, bi gotina we mirov nikare qala “jiyaneke birûmet” bike. Hewce ye ciwan eşqa xwe yî strîptîzê, twerkê, jartiyeran û hwd. bi dilekî rehet bi lêv bikin(!) Xeman nexwin, zimanê me yî qedîm têra sîyasetê, edebiyatê, zanistê û her wiha têra fanteziyan jî dike, lê ewil divê em ji bo rojên bi wesf, ji niştîmanî ciwan re, bibin pizotek da ku agirê me geştir bibe. Min ne armanc e, kesî bişibînim heywanan, tenê



dixwazim em hinekî ji komplîkebûna jiyane dûr bikevin. Belê, heywanê neyê hewandin, goşt nagire. Divê em berê xwe bidin xwe, kesê berê xwe nede xwe, mehkûmê lênêrîna xelkê ye. Wekî din mirov dikare vê pirsê jî bike û her wiha mirov dikare li ser vê mijarê nîqaşeke kûr û dirêj jî bike; “Potansiyela ciwanên Kurd çi ye? Mala min ê ew bilbil in, vêca dora me ye?” û werhasil mirov dikare ji pirsan qûleyekê çêke û xwe bigihîne ezmên lê em bi kurtasî bêjin; ew jî

wekî hemû Kurdan sloganhez in û ti carî ji ya xwe nayên xwar. Her tim “An Azadî, An Azadî” zor xweş tê bi wan jî, ew jî têra xwe kêm û nîvco ne.

Wekî gelek em ê jî bi hev re ronî bibin, tariyeke hewqas dijwar xûya nake. Çax, çaxê teknolojiyê ye û kes bi vidyoyeke “challenge” ê bi milyonan nayê temaşekirin, ji xwedê ve guneh e, em bi kompleksa xwekêmdîtîne tevnegerin. Bihêlin bila em jî hinekî ji şert û mercan îstifade bikin, ji ber ku di vê riya şertan de riya azadiyê “navxweyî” derbas dibe. Qene “şîrê hunera me bête danîn û qedrê qelema me bête zanîn.” Ciwanan bigrin cem xwe û bihêlin bila di nav we de azad bin. Ne wiha be hê wê gelek caran darê kurme tecawizî darê bike, çiqas ne kêrhatî bin jî, xwedî lîbîdoyeke qerase ne. Her yekî ji me -hemd ji Rebê Alemê re- 20 xwişk û bira ne. Me tim got, bi teksîr û keska şêx, Xwedê te’ala hêjmara me zêde bike lê zêdebûneke virt û vala wê ti carî bi kêrî me neyê.

Û carek din hûn bi xêr hatin kanala min, ez Mansûr, lê insanên li derdora min bi kurtasî ji min re dibêjin, “We evê ‘entîke ji ku anî?”



POP PIRS

Hêja Netirk

Hêja Netirk, di sala 1988an de li Mêrdînê ji dayik bû. Li Kulûba Folklorê ya Zaningeha Boğaziçiyê dest bi muzikê kir. Li Zaningehê bo 4 salan edîtorîya kovara Yazınca/Wêjestêrkê kir. Di Kovara Zaremayê de xebitî. Di sala 2015an de, li Zaningeha Boğaziçiyê Beşa Edebiyata Îngilîzî qedand. Heman salê, ji Zaningeha Columbiayê qebûl stend ku li ser edebiyata Kurdî bixwîne. Di sala 2016an de ji ber sedemên siyasî hat girtin. Li Girtîgehê hînî lêxistina gîtarê bû û besteyên xwe yên ewil çêkirin. Hêja Netirk niha wek penaberekê li Elmanyayê dijî û albûma xwe ya ewil amade dike. Ji hêlekê ve ji xebatên sînemayê didomîne.

Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Belqitiyo!

Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Dengê vekirina bîrayê.

Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Dema min biryar da ez albûmekê çêkim.

Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Min ê li şîretan guhdarî nekira.

Tehemula te ji çi re tune ye?

Însanên pir hêdî diaxivin û gotinên xwe tekarar dikin.

Tiştê ku îlhamê dide te çi ye?

Tiştên nejrêzê

Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Ciwan Haco, Leonard Cohen

Dîmeneke çawa te aciz dike?

Dîmena dengbêjên bi kurdî pesnê êrîşa li ser Efrînê didin.

Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Filmeke Kurdî Oscarê bistîne.

Te dixwest tu li ku derê bijî?

Li cîhaneke bêsînor.

Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje.

“Min navê xwe kola li bircên Diyarbekir”

Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Ez zû hêrs dibim.

Çi kenê te tîne?


Jinên xwedî cesaret.

Tu dixwazî çawa bimrî?

Ez dixwazim pîr nebim û bimrim.

Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Peya hat û Siwar çû.



JI STADYÛMÊ

ber bi Kerxanê ve



Bîranîneke Nejbîr!

Ali Fikri Işık

polesar@gmail.com

Qet ji bîra min naçe, ez 9-10 salî bûm, li Batmanê em bi malbatî, havînan li hewşê, li ser text radizan. Lawoooo! Çiqas xweş bû, xewa li bin stêrkên asîmana ku ji moristankên li ser erdê zêde bûn. Serê sibê gava ku tav diavêt, em bi coş ji xew şiyar dibûn, me nivînên xwe dipêçan û radikir aliyekî. Tehma wan rojan hêj di devê min de weke şîr û şekir e. Rojekê min jî aliyê diya xwe dikir da ku em nivînan bipêçin û rakin, min destê avêt balîvekî, ez çi bibînim; sê 25 qiruşên zerik, çavê xwe belot kirine û li min dinêrin. Ez, aniha jî karim ji we re sond bixwim da ku min ew perên zerik bêhemdî, ji nişka ve xistin berîka xwe. Gava ku ew qiruşên zerik, di kefa destê min de bûn, tu mebesta wan pereyan di mejiyê min de nebiriqîbû. Lê dîsa jî min dizanibû ku ez ê bi wî pereyî çi bikim. Hema min zûka karê xwe qedand û min berê xwe da sikaka taxa me.

Min baz da çûm li deriyê hevalê xwe xist. Sabri, Doğru, Abdullah Solmaz, Şuayip Hacıoğlu, Osman Uslu û hinekên din ên ku aniha, gava ku ez vê nivîsê dinivîsim navên wan nayên bîra min, min hemû civandin û me berê xwe da dikana ku forma lê tê firotin. Wê demê me ber davêt ku em jî wekî xelkê bi forme bi topê bilîzin. Me biryar dabû ku di demeke kin de pere bicivînin û ji xwe re dozdeh cot forme bikin. Min ji her kesî pere sitend û bi ser de min ew pereyê diziya malê, xist ser û dozdeh cot formê kirin.

“Piştâ Çolê”

Ha hooo! kêf kêfa me bû, şûr simbêlê me nedibirî. Me baz da, em çûn “piştâ çolê.” Wê deme cihê ku me lê futbol dilîst ew der bû. Navê wê “piştâ çolê” bû. Bi qur’ana we xwendî, wê rojê heta ku şev bû tarî, me top lîst. Haya me ji bayê felekê tunebû û tu tişt ne xema me bû. Hema bêjin di rojekê de belkî me 5-6 maç kirin. Piştî ku êdi hal û taqet di me de nema, em vegeyriyan mala xwe. Bi ken û coş, bi xeberdan û henek, em di riya vegeyriyê de bûn. Gava me xwe gihand sikaka nêzî mala me, hahooo Şêxê Şeroyê bavê min, Clint Eastwoodê di “Baş, Xirab, Kîrê”ê de, gavên xwe vekirine û li benda min e. Bi dîtina bavê xwe ez hay ji xwe bûm û nava min qetiya. Ji revê pê ve tişteke nehat bîra min û hema ji nişka ve min dest bi revê kir.



Demekê Beşîrî Spor



Demeké SilvanSpor

Ez direvim û bavê min dide dû min. Me du caran tax, wekî çemberekê bi dor kir û em beziyan. Ji bo dora sisiyan êdi ceger bi min re nemabû. Min xwe sist kir, cewrikek çawa dûvê xwe têxe nava ranê xwe û bi-melise, min jî wiha kir. Bavê min hat, bi pa-skura min girt û piyê min ji erdê bilind kir. Wî ez bi serserkî li erdê xistim. De îca ne carekê belkî sê-çar caran. Ez beziyam hundirê malê. Bavê min li dû min hat û destê xwe avêt çifteya ku li diwêr darve kiriye. Ji rexta fişekan, fişekê derxist û da ber namlûya çiftê. Berê çiftê da min ku bera min bide. Di wê kêliyê de pîrka min Şero, ket navbera me û ji kurê xwe re got “ma tu ehmeq î, ker î, tu har bûyî?” Bavê min pir ji diya xwe ditirsiya. Di cî de sekinî, wekî ku hişê wî hatibe serê wî, hay ji xwe bû û dev ji min berda.

Lê min dev ji lîstina topê berneda. Hema bêjin her roj ez diçûm ku bi topê bilîzim û êvarê bavê min li min dida. Ew êdi bûbû spora me ya netewî. Min maliyeta lîstika topê bi rih û canê xwe dida. Mafê tu kesî nîn e ku ji min re bêje “tu çima bi topê

dilîzi? Bo çî li ser vê malxirabê difikirî û tu çima wiha bêrawest dinivîsinî?” Na heyra! Qedera min û futbolê yek e. Ma çî ji we re ye! em ji hev hez dikin.

Ez dîsa li xwe mikûr werim û qala meseleyeke ji jiyana xwe ya futbolê bikim ji we re. Piştî ku ez transferî tîma Farqinê bûm, li Diyarbekirê, bi qedandina maça Taksimsporê re, ku di wê maçê de min jî goleka avêtibû, ez hê di 17 saliya xwe de bûm. Navsereyekî tîmê, di odeya cilguhertinê de, berê xwe da min û got “Elîkooo! ma tu bûyî Millî?”

Pêşî min ew gotin fêma nekir, ku pîrçînî bi lîstikvanên din ket, ez soro-moro bûm û ketim ber fediye.

Go “Wî lawoo! Lehengê maça îro hêj nebûye millî! De rabin em giş bi hev re aliyê wî bikin û berê xwe bidin “dört ayaklı minareyê”... Belkî hûn bawer nekin, bi sond û qesem, taqim hemû bi min re hatin kexaneya Diyarbekirê û wê şevê ez kirim Zava...

Şabaş ji jiyana futbolê re.



ME JI 10 KESAN PIRSÎ

Te kîjan filma kurdî du caran temaşê kiriye? Bo çi?



MENSUBE KARTAL

Kurtefilma Tofiq Amanî ya bi navê **“Ants Apartment”**... 4-5 sal berê min ew film cara yekem li Festîvala Fîlman a Yılmaz Güney temaşê kir. Fîlm li ser Qetlîama Enfalê ye. Taybetiya vê filmê ev e; derhêner li şûna ku rasterast behsa qetlîamê bike, bi awayekî kreatîf, bi şêwazeke afirînerî qala Enfalê kiriye.



SÎDAR ÖZMEN

Min ê bigota **“Dema Hespên Serxweş”** lê zarokatiya min dev ji min berneda. Ne şaş bim sala 79an bû. Nisêbîna berê. Xort hemû “telebe” bûn. Li ser zimanê her kesî “Sürü” hebû. Wê bê “Aslan Sînemasi”. Min jî xwe li serê yên me kir bela ku min jî bi xwe re bibin û em çûn. Însan li ser serê hev siwar dibin. Cara pêşî ye diçim sînemayê. Xwedê ez stirandim ku di bin lingê kesî de nemam. Û bi dengên Kurdî, filmê dest pê kir. Pê re jî çepik... Şivan, Bêrivan, Hemo, Silo... hemû Kurd. Keriyên pez... Pez pezê me, berberî berberiya me, hejarî... û avahiyên bajarê Enqerê, mirov weke lehiyê diçin û tîn, li ser avahiyên reklamên bankeyan. Û yeke din; muzîk. Kengî radihêjim tembûrê, hê jî bêyî hemdê xwe muzîka **“Sürü”**yê lêdixim.





LEYLA KAYA

Gelo sînemager an jî filmên heyî tesîre-ke baş li berdewamiya sînemayê an jî sînemaya “welat”ekî dikin an na? Dibe ku temaşevan vê meraq bikin. Helbet di vê meselê de mirov nikare tiştêkî mutleq bibêje lê niha ji bo bersiva vê lêgerînek heye, dibe ku netîceyek jê derkeve. Bi ya min; Behmen Qubadî derhênerêkî wisa ye ku rastiyê û surrealîzmê bi hev re pêşkeş dike û metodên sathî wî tatmîn nakin. Qubadî dikare dram û “mîzah”ê bi hevdu re deyne ber bîneran. Tam ji ber van sedeman, “**Nîve-Heyv**”a wî, di nezera min de xwedî cihekî taybet e.

Li gorî Worringer, xweşikiya berhemeke hunerî, girêdayî serkeftina wê ya “bextewarkirin”ê ye. Bi ya min tîkiliya vê “bextewarkirin”ê bi pêdivî û kêmasiyên ruhî re jî heye. Loma jî mirov dikare bibêje ku “daxwaza mutleq a hunerî” pîvanek e ji bo van pêdiviyên diyar bike. Li ser vê em gotineke Mamo ya di filma “Nîve-heyv”ê de bînin bîra xwe; dibêje “Min derxe sehneyê! çi bi saxî çi mirî.” Ev hevok, diyardeyeke “micadele”yê ye û herwiha me dibe ser mesaja filmê jî: diwariya coxrafyayê. Serkarakterê filmê Mamo ye. Mamo, tevî hevalê xwe yê hunermend, derdikeve riyekê. Yanî filmeke “rê” ye. Coxrafyaya Kurdistanê, însan û mekanên di filmê de me li ser piyan dihêlin lê ji aliyekî ve jî me dibin ber bi asêbûnekê ve. Li wê asêbûnê “menzîl”ek heye. Mamo pir dixwaze konserteke li Kurdistanê bide bes bi miraza xwe şa nabe û can dide. Lê êdî meqseda wî çûye serî. Erê “Nîve-heyv” filmeke “rê” ye lê ji hêla din ve filma “nîvcomayînê” ye. Ez dibêjim qey pirsên li ser filmê divê tam jî ji vê derê dest pê bikin.

Bi kurt û kurmancî; ev rêwitiya ber bi Kurdistanê ve ye ku li gorî gelek kesan, welatekî wisa tune ye. Sînemaya welatekî nîşan dide, sînema Kurdistanê.



MERWAN KORKMAZ

Piştî vê pirsê we yekser filma “**Textê Reş**” hat hişê min. Rû û zehmetkêşiya wan zarokên kolber, meş û bêtaqetiya wan kalan.. Û textê reş. Ew text qedera vî gelî simbolîze dike bi ya min. Êşên miletê me ku di navbera wan sînorên çêkirî de jiyaye û dijîn. Israra wî mamosteyî ya bo hînkirina xwendinê, Celadet Alî Bedirxan anî bîra min ku di pirtûka xwe ya “Gazinda Xencera Min” û hinek nivîsên xwe de behsa girîngiya xwendinê bo xilasîya miletê me dike. Welhasil siberoja me girêdayî nifşên nû û xwendina wan e. Zarokên “esl û xwenas” û perwerdekirî, dê me ji qedera wî textê reş xilas bikin li ser textê vê cîhana bextreş.





TUBA YALÇIN

Filma “Min Dît”, di 2009an de derket pêşberî temaşevanan. Derhênerê filmê Miraz Bêzar e. Vê filmê tesîreke mezin li ser temaşevanan çêkir, ji ber ku film, perçeyê ji jiyana temaşevanan e.

Film li ser faîl-î meçhûlan e. Him ji ber mijara filmê, him jî ji ber karakteran, çend rojan ez gelekî di bin bandora filmê de mam.

Di filmê de karakterên sereke Gulistan û Firat in. Sehneya kuştina dê û bavên wan ku bûyer li ber çavên wan diqewimî, gelekî tesîr li ser min kir. Li gorî min trajediyeke mezin bû. Piştî dê û bavên wan tîn kuştin, Gulistan û Firat bi tena serê xwe dimînin û ji bo wan tenêti, feqîrî û bêkesî dest pê dike. Herî zêde jî Gulistan vê tenêtiyê bi çavên xwe diqîre. A ku min herî zêde nêzikî xwe dît, karaktera Gulistan bû. Gulistan ne bi peyvnan, tim bi hêsiyên xwe dipeyivî. Nizanîbû bi dengê bilind bigiriya. Hebûn û nebûna xwe bi çavên xwe yê wekî xezalan diqîriya.

Dema Gulistan û Firat di kuçeyên Amedê de dimeşyan, min wekî ku ez jî di wê sehneyê de bim, hîs dikir. Li gorî min ev film kurteya jiyana zarokên Kurd e.



KENAN ARSLAN

Min filma “Di Navberê de” ya Ali Kemal Çinar ji du caran zêdetir seyr kiriye.

Film behsa Osman û zehmetiyên ku di jiyana rojane de rûbirû dimîne dike. Zehmetiya Osman a sereke ew e ku Osman Kurd e, li cihekî wek Diyarbekirê dijî û nikare (nizane) bi kurdî biaxive. Osmanê min û we, dema pirsên bi Kurdî jê tîn kirin bi Tirkî dibersivîne, ev yek jî di kesayeta wî de dibe sedema xirecirê. Bo Osman nezanîna zimanê xwe yê zikmakî, dibe sedema nenaskirina xwe û ev jî tesîreke neyînî li ser jiyana wî dike. Ewqas ku Osman ji ber vê nikare bizewice jî. Welhasilêkelam Osmanê min û we “di navberê de” maye.





SAÏD ÖZMEN

“My Sweet Pepper Land”...

Min ne tenê du caran, gelek caran li vê Filma Hiner Saleem a ku sala 2013an derket, seyr kiriye. Di filmê de gelek mesaj hene. Yek ji wan peyaman ev e; piştî heyameke dirêj a bêdewletbûnê, Kurd, li Kurdistanê serbixwe bê ka zehmetiyên çawa kîşandîne? Ev yek bi awayekî absurd hatiye nîşandan. Peyameke din a balkêş jî ew e ku serkarakerê filmê Baran (Korkmaz Aslan), piştî şerê serxwebûnê li mala xwe vedigere, (ew peşmergeyekî leheng û idealîst e) wekî mirovekî ji rêzê tê pêşwazîkirin û li sikakên gund, cîranên wî jê re gotinên wekî “Tu ji şer vejeriyayî û ji xwe re li jinekê digeri” dibêjin... Di her şerê serxwebûnê de şervan wekî lehengan vedigerin lê çima li Kurdistanê serbixwe leheng bê qedr û qîmet vedigerin malê!?

Bindestiya jinê û erka wê ya civakî, derhêner bi çend dîmenan nîşanî me daye. Di dîmena ku serkaraktera filmê Govend (Golshifteh Farahani) ji bira û dergistiyê xwe re dibêje “Hûn herin namûsa xwe biparêzin, ez ê jî namûsa xwe biparêzim.” Herwiha dîmena kuştina Axa ya bi destê jinan jî balkêş e. Yek ji tiştên ku ev film ji min re biqedirtir dike jî ew e ku derhêner, jin bi destê mîrekî xilas nekiriye, jin bi xwe, li hember zehmetiyên sekiniye.

Ji xeynî van; ev film ji bo min taybet e, ji ber ku li Kurdistanê derbas dibe, her çar zaravayên Kurdî têne axaftin û Kurd ne bi dijminê xwe re, bi jiyana Kurdan a rojane re şer dikin. Kurd qaçaxiyê jî dikin, evîndar jî dibin, li Elvis Presley jî guhdar dikin, li Mozart jî guhdar dikin û dikarin li çiyayên Kurdistanê bibin Kovboy jî.



MÛNEVVER ASLAN

Min filma Kurdî ya “Sirta La Gal Ba” gelek caran temaşê kiriye, ji ber ku ji aliyê sembolan ve pîrr dewlemend e û fêmkirina wê hinekî zehmet e. Di her kêliyêk û sahneyeke filmê de sembolek heye. Her tişt bi wateyê giran ve girêdayî ye. Di navbera jiyana û mirinê, hebûn û tunebûnê de qêrînek heye; qêrîneke zirav û dirêj. Ew qêrîn sehwekê dixê dilê temaşevanan. Belkî ji ber vê sehwe be nîzanim mirov xwe di nava şewata Enfalê de hîs dike. Lê di dawiyê de girî dibe sembola jiyana û hêviyên nû.






TUĞBA KARDEŞOĞLU


Dema Hespên Serxweş – Behmen Qubadî

“Îro dinya sar e. 4 şûşe alkolê bixe nav ava heywanan.” Tevî ku ez ne şarezayê hunera sînemayê me jî, ez hema li ber rûniştim û bi heyranî min lê temaşe kir. Heçku ji serî heta binî, film bi kamerayeke veşartî hatibû kişandin. Ez heyirî mabûm li hemberî realîzma wê. Dramayeke bêhempa bû. Nizanim çima lê filma “Hêvî” ya Yılmaz Güney anî bîra min.



EKREM MALBAT

Ziman ne Kurdî ye lê filma Kurdan e. Bi vî awayî filma ku min çend caran temaşe kiriye “Bahoz” a Kazım Öz e.



EZ AŞPÊJEKÎ BÊNAV IM



Bêbeş

Bênav

Bêmail

Di serî de silav û hurmet xwînerên xweşik ên POPKURD'ê. Ez Aşpêjê Aşxanê û Kebanîkê Mala xwe. Ez ê ji we re qala karê xwe bikim lê beriya wê ez çawa ketim vî karî û çawa jîyana xwe berdewam dikim, ji we re behs bikim.

Ez jî wekî gelek zarokên Kurd, li malbateke xizan mezin bûm, ji ber vê jî ez hê dema xwendekarê dibistana amadehiyê bûm, dixebitîm. Karê ku ez tê de dixebitîm, ji ber ku ne bi dilê min bû û min nedieciband, hertim min karên xwe guhertin. Ji ber wê jî ez di gelek karên cûda de xebitîm. Ji firotina şêranî, bestenî û simîdan bigre heta daneheva mişmiş, findiq, tirî, bacan û heta karên înceatê, di gelek îşan de xebitîm. Piştî ku min tu xêr ji van karan nedît, neçar mam û li ser gotina gelek heval û xizmên xwe, ji bo kar û xebatê çûm bajarê Bodrumê. Dema ez hatim Bodrumê, ji hemû aliyên ve min zehmetî kişandin, ji ber ku çand û jiyana me ji hev gelekî cihê bû. Seba ku ji çar aliyên cîhanê mirov dihatin wir, tevliheveke mezin çêbû di jiyana min de. Mînak; lixwekirina cil û bergên mirovan, nêzîkatiya zilaman a li hemberî jinan û dîsa rihetbûna mirovan... Ez ne hînbûyî van tiştan bûm. Di nav jiyanêke wisa de min dest bi karê firaqşûştinê kir. Destpêka aşpêjyê firaqşûştinê e. Jixwe aşpêjên ku firaq neşûştin, bila nebêjin em aşpêjin."

Dem a min dest bi aşpêjyê kir, min dît ku karekî zêde balkêş û cûda ye. Min tu carî xwarinên wisa cûda nedîtibûn, min çav û guhê xwe vekirin û bi ser vî karî de çûm. Ji kêzik-mêzikên nav avê bigre, heta goştê berazan, min çêkirina xwarinên gelek balkêş dît. Min wê demê fêm kir ku çanda xwarin û vexwarinê jî heye. Herwiha her herêm, ji layê xwarinê ve xwedî taybetiyeke cuda ye. Mînak, li bajarên Kurdistanê Kutilk, Ûr û Rovî û hwd. bi nav û deng in. Li aliyê dî, li bajarên xerbê, xwarinên





cûdatir hene. Mîsal, bi heywanên ku di nav behrê de dijîn, xwarinên cuda tên çêkirin. Xwarinên ku li van xwaringehan tên çêkirin, xîtabî gelek kulturan dikin, ji loma jî, ji van cihan re dibêjin “Mitfexa Cîhanê.” Çêkirina van xwarinên herêmî, li ser min tesîreke mezin çêkir û min biryar da ku ez bibim aşpêjê van xwarinan, ji ber ku xwarinên herêma me, pir xweş û cuda ne lê nehatine naskirin.

Ev karê min bila li vir bimîne niha. Tiştêkî din ê ku min zehf dixwest; xwendina zanîngehê bû. Min beşa Civaknasiyê qezenc kir. Beşa civaknasiyê, ji bo çareserkirina pirsgirêkên civakî, xwedî rol û mîsyoneke mezin e lê di roja îro de, di nava vê pergalê da civaknasî pir girîng nayê dît. Bêguman ji bo ku ez xwendina xwe bidomînim, gerek e min karê xwe yê aşpêjiyê jî bimeşanda. Ev ji bo min gelek zehmet bû, ji ber ku rewşa malbata min ji aliyê aboriyê ve ne baş bû, wan jî nedikarî zêde pere bidana min. Li gorî derfetên xwe ez li ser van her du karan jî sekinîm û xebitîm. Piştî demekê min zanîngehê kuta kir. Bi qedandina zanîngehê re, min hemû enerjîya xwe da karê aşpêjiyê. Her ku diçû min hunera xwarinê fêm dikir û û min xwe pêş dixist.

Çawa min di serî de jî got, aşpêjê aşxanê û kebanîkê mala xwe me. Ne tenê li xwaringehê, li malê jî û li cem hevalan jî min ev aşpêjtiya xwe nîşan dida.

Vê gavê min li Eyuba Stenbolê, bi navê “Huner”, cihekî xwarinê vekirîye. Berî dîkê sibê rabin ez şiyar dibim û derim xwaringehê. Pêşî kêmasiyên xwaringehê yek bi yek dinivînim û distînim. Paşê ji bo mirovên sibê zû xurîniya xwe dikin, şorbe û taştîya wan amade dikim. Em bi rûkenî û bi kelecaneke mezin mêvanên xwe pêşwazî dikin.

Piştî taştê em amedekariya xwe ya firavîne dikin. Ji bo pijandina goştê xwe em agirê xwe gurr dikin. Piştî nivro heta êvarê, xwarinên giran çêdibin, ji bo vê jî amedekariyeke mezin hewce dike. Ev xwarinên giran piranî bi goşt in. Xwarinên bi goşt her wext nayên xwarin, ji ber ku herisandina goşt wextekî dirêj jê re divê.



Gotineke dayika min heye, dibêje “Sibehan parî parî, nîvro heta tu karî, êvarê ji xwe re nexe barî.” Ji bo ku mirov bi xwarinê aciz nebe, hewce ye di wextê xwe de xwarina xwe bixwe. Piştî şîva êvarê jî, em derdora xwe didin hev û paqijiya dikana xwe dikin. Piştî karê me xilas dibe, em hesabê xwe yê rojane dikin, li kar û xisara xwe dinêrin û rojeke aşpêjiya xwaringehê diqede.

Niha hûn dibêjin; “malnemîrat te ewqas behs kir, ka gelo xwarinên te çawa ne?” Ji bo hûn vê test bikin ez li benda we hemûyan im, ser çavan.

Edresa me ev e: Taxa Yeşilpınarê, kolana 3.Ortanca, No:8/B, Hûner Kebap Salonu, Eyüp/ İstanbul



GELO TU KENGÎ Û ÇAWA BI KURDBÛNA XWE HISIYAYÎ?



KA JI ME RE BÊJE!

POPKURD

popkurd@gmail.com



H.Kovan Baqî: Ca min di malzarokê de ez bi Kurdbûna min hesandim. Loma berî jiyinê Kurd bûm û piştî mirinê jî ez ê Kurd bim.


Çiya Mazî: Di 6-7 saliya xwe de, yanî di salên 67-68an de, dema bavê min li radyoya Yerevanê guhdar dikir, bi Kurmanciya xwe hesiyam. Di 16 saliya xwe de jî li dibistanê, bi destpêkirina fikra çepgiriyê, ez bi Kurdbûna xwe hesiyam, li Şemrexa Mêrdînê.

Songül Keskin: A rast ji wexta bîrewer bûme û vir ve, em Kurd(kurmanc) bûn. Ez pê nehisiyam ez weke Kurd çêbume...Di 7 saliya xwe min dest bi dibistanê kir û haya min ji Tirkan çebû.

Zinarê Xamo: Min tim û tim xwe Kurd hîs kiriye. Dê û bavê min Kurd bûn, bi min re bi Kurdî dipeyvîn û ez jî wek zarokekî Kurd mezin bûm. Gava meriv Kurd were dinyayê, meriv dê çawa xwe tiştêkî din hîs bike? Bavê min merivekî Kurdperwer bû û em jî werê mezin bûn.

Tahîr Tahîna: Ez di zikê diya xwe de bi Kurdbûna xwe hisiyame. Niha tê bîra min gava temenê min 5-6 salî bû, digotin "Kurdistan bibe dewlet dê qiyamet rabe." Ne qiyamet rabû ne jî em bûn dewlet.

Roşeng Rojbîr: Li gund, li dibistana seretayî, dibêm qey ez xwendekarê pola sêyemîn bûm, dema bi pênc hevalî re, me mamosteyê xwe kir nav xelesa xwe, gef lê xwar û got: "An tu yê cardin sirûda serdestan bi me nedî xwendin, an jî em ê li te bidin." Wê demê me Sirûda Ey Reqîb ji ber dizanibû.



TEXTORA DÎNAN



Esra Yılmaz
psychologistt001@gmail.com

Sal 2012 bû dema ku ez çûm zanîngehê, beşa psîkolojiyê. Di mehlê de heya wî çaxî ji min pê ve tu kes neçûbû zanîngehê. Ê willeh eyb e mirov bêje lê ji qewla tirkan ve “hewa min 1500 bû.” Erê ez xwendekarê beşa Psîkolojiyê bûm, ez hêj nebûbûm psîkolog lê dema ku min li însanên derdora xwe dinêrî, hema min dixwest ku ez nexweşiyêke psîkolojîk bi wan ve bizeliqînim. Min digot ev zilam çiqas dikare pesnê xwe bide, ji xwe gelekî hez dike, ev teqez narsîst e. Ev jin çiqas zû digirî û dikare bi hesanî rol bike, ev jî teqez hîstriyonîk e. Ev ê din paronayak e. Ev di depresyonê de ye. Ew ansiyoz e. Bi sedan mînakên wisa hene ez dikarim bêjim. Carnan jî dema ez diketim civatekê û dibihîstin ku ez psîkolojiyê dixwînim



hema ji nişkê ve digotin hele ka li me binêre bê ka psîkolojiya me çawa ye û zîq li çavên min dinêrîn. Tu dibê qey li ser eniya wan dinivîse bê ma çiyê wan heye. Ma qey ez şêx im heyran, ez çî me, ez ji ku dizanim bê ma çiyê we heye? Wexta ku ezmûnên min diqediyên û dibû tehtîl, ez dihatim malê. Nas û dost û cîran jî dihatin serdana min. Erê dizanîbûn ku ez çûme zanîngehê lê gelekên ji wan nizanîbûn ku ez çûme kîjan beşê. Rojêke ji wan rojan cîrana me, xaltîka wesîlayê pirsî û got “tu kîjan bolimê dixwîne vêca keça min? Li ser xêrê be, ma’hlîmtî ye, çî ye?” Min jî spasî wê kir û min got ez psîkolojiyê dixwînim xaltîka wesîla. Tiştêk fêhm nekir a rastî û li benda tiştên din bû ku ez jê re bêjim. Heta ji min hat min bi awayekî hêsan danasîna psîkolojiyê kir û min got psîkolog jî bi însanan dadikevin, lêkolînan dikin û hwd. Dîsa jî tiştêk fêhm nekir û wekî ku piçekî fêhm kiribe, çavê xwe fireh kir, serê xwe hejand û bêdeng ma. Hema hê mesele wilo dom dikir pîrka min Qesîda ket navberê û xwest ku alîkariya min bike û got “keçê textor e textor, textoriya dînan dixwîne, şîretan li xelkê dike xuha min, ê ku dixwaze tiştinan bêje li wan guhdarî dike û ji wan re dibêje wilo nekin, wilo bikin, çênabe, eyb e, vê carê bidin xatirê min û tiştên wisa...” Kenek bi min ket lê ji bo ku nefikirin ez henekên xwe bi wan dikim, min xwe bi zorê girt. Rehma Xwedê li pîrka min be meseleya me jî bi vî awayî safî kir û ji qewlê wê ve ez bûm “textora dînan.”

Bi kurdî hînî îngîlîzî bibe!



KURDISH
| KURMANCÎ |
LESSONS

TWITTER : @kurdishlessons

INSTAGRAM : @kurdishlessons_

Bi îngîlîzî hînî kurdî bibe!

